Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1232 | 22-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Sûdên muzîkê ji bo mirov çi ne?



Hemza Sêvo/ Qamişlo

**Muzîk yek ji alavên ji bo şadwerî, aramî, xemgînî, geşbînî, dermankirina fîzîkî û derûniya mirov tê bikaranîn. Muzîk zanisteke bi dirêjahiya dîrokê ji çerxên kevnar heta roja îro hatiye bikaranîn û bûye cihê sûdmendiyê.**

Di destpêka dîroka mirovahiyê de muzîk ji bo çareserkirinê sûd jê hatiye wergirtin. Di ferhenga destpêkê ya Tarîtiya Afrîqiyan de, mirovek bi navê "Şaman" ku rêberê muzîk, bîjişk û zanayê olî yê hoza xwe bû, muzîk ji bo çareseriyên nexweşiyên laşên nexweşan sûd jê wergirtiye. Çîna şaristaniya hindiyan jî, ji bo çareseriyên bijîşkî ji muzîkê sûd werdigirtin. Ji aliyekî din ve romiyan muzîk bo çareseriya nexweşiya Tao`n(Hala Reş) û bêxewiyê bi kar tanîn. Ji sedsala 17'an heta nîva sedsala 18'an, muzîk bi parastina girîngiya xwe, weke alîkariyekî bijîşkî ji bo padîşahan sûd jê hatiye wergirtin. Nivîskarên wekî Spênsêr û Şêkispyêr têkoşîn kirin da ku di wê serdemê de têgeheke zanistî li muzîkê bo dermankirina pirsgirêkên derûnî ava bikin. Di sedsala 20'an de, bi sedema derencamên muzîkê di çareseriyên bijîşkî de, girêdana pîşeya muzîkdermanî pêk hat û bi taybet di pîşeya derûnî ya bijîşkî de berfireh bû. Yekemîn encûmena muzîkdermaniyê di cîhanê de, Encûmena Muzîkdermanî ya Amerîkayê bû ku di sala 1950'î de hate avakirin. Herwiha di sala 1971'ê de jî Encûmena muzîkdermanî ya Amerîkayê pêk hat û herdem li gel vê yekê, sêyemîn navenda girîng a muzîkdermaniyê bi navê Navenda Encûmena Muzîkdermanî ya Kanadayê jî di sala 1974'an de hat avakirin. Pêkhateya fîzyolojîkî ya hiş di bersivdana bi muzîkê re tê guhertin, bo mînak tansiyona xwînê û lêdana dil pêwendî cura muzîkê heye. Herwisa muzîk baskan aram dike, "Andirofîn"ê bilind dike û hormonên strêsê kêm dike. Lêkolînên di wî warî de behs li ser vê yekê dikin ku heta 15 deqan guhdarkirina muzîkê, bandoreke erênî li ser mirov heye. Bi baldana bi cureya deng, muzîk dikare, aramiyê bide mirov, mînak, ew alîkariya hînbûnê û hîniyê dide û şiyana konsantrasyonê bilind dike. Lêkolînek li ser xwandekaran hatiye encamdan, nîşan dide ku yên dema muzîka klasîk guhdarî dikin, pirsên bîrkarî yên xwe baştir bersiv didin.

**Bandora muzîkê li ser derûnî û fîzîkiya mirov**

Herwisa bandora muzîkê li ser hestên mirov heye, bo mînak li ser xewa zarokan. Di hişê mirov de, navendek ji bo wergirtina muzîkê li pişta navbera çavan de heye, ku erka hînkarî û gotina hestên mirov digre stûyê xwe. Her bi vê sebebê jî, di navbera muzîk, hînkarî, kontrol û gotina hestan têkiliyeke rasterast heye. Di heman demê de zaniyar gihîştine vê encamê ku mirov di warên cuda de, helwestên hember muzîkekê, refleksên cuda ji xwe nîşan didin. Ji ber ku rewşa derûnî ya mirovan di demên cuda de bi hev re cuda ne. Divê em zanibin ka kîjan muzîk aramiyê tîne hişê me û laşê me aram dike; divê em zanibin ku muzîk çi "strês" û "xemgîniyê" çêdike û dibe sedema nexweşiyê. Lêkolîn di derbarê vê yekê destnîşan dikin ku muzîkê ev şiyana ku mirovan li hember nexweşiyên derûnî û fîzîkî diparêze, an rola derman dilîze û êş û janên wan kêm dike û pêş ji rûdana hinek bûyeran digire. Herwiha ev lîkolînên han li ser vê yekê tekez dikin ku dibe di dermankirina nexweşiyan de, bi hûrbînî bal bê dayîn li ser curên muzîkê. Lêkolîner gîhaştine wê encamê ku muzîk bandora xwe li ser hûrbînî, rewş, dîtyarî û têgihiştina mirovan heye. Muzîk bandoreke xuyabîn li ser aramkirina rewşa krîzên nexweşiyên beşa "ACU" (nexweşiyên guhan) li nexweşxaneya heye. Sîstema hiş, bersivdana erênî ji "dengderên muzîkan" re dide û bi giştî muzîk di guhertina rewşa nexweşan de bibandor e û sûdwertin ji muzîkê, dibe sedema arambûna ruh û rewşa hiş.

Çend kesayetiyên binavûdeng ên cîhanî di derbarê muzîkê de wiha gotine:

Eflaton: Muzîk rûmeteke exlaqî ye ku ruh dide cîhaniyan, baskan dide ramanê û jiyanê dide her tiştî.

Beethovên: Muzîk semboleke bilindtir e ji her zanist û felsefeyekê. Muzîk hunera zimanê dil û ruhê mirov e û bilindtirîn ronîkirina bedewiya mirov û cîhanê ye.

Hîgil: Muzîk hunera taybet ya ruh e û rasterast bi dengê xwe can dike.

Nietzsche: Hemû diyarde, bi danaberheva li gel muzîkê, tenê sembolek in.

# Sembola jiyana komûnal: Koçerî

Navenda Nûçeyan



Li Kurdistanê koçerî xwedî dîrokeke kevnar e. Li dijî modernîteya kapîtalîzme koçer, çanda dîrokî ya komînal diparêzin. Koçerî jiyaneke komînal e. Koçer hemû karî bi hev re dikin û jiyana parvekirinê esas digrin. Bi modernîteya kapîtalîst ve takekesî pêşketiye, lê koçerî berovajî vê yekê li dûrî modernîte jiyaneke bi hev re û parvekirinê esas digrin. Bi demsala Biharê re barê wan li ser milê wan e û dadikevin çiya û zozanan. Heta demsala payîzê jî li zozanan dimînin. Debara wan jî li ser xwedîkirina sewalan e. Helbet zor û zahmetiyên koçeriyê jî hene. Her demsalekê li warekî ne. Mala wan her li ser milê wan e. Rêya wan dûr û dijwar e. Bi hincetên "Ewlehiyê" dewletê gelek zozanên Kurdistanê qedexê kirinê. Ew qedexê jî herî zêde li ser koçeran bandor dike. Her wiha zexta lêşkeriyê hertim li ser wan e. Sixurtiyê li ser wan ferz dikin û dema ew li dijî vê yekê tên neçar dimînin ku koçber bibin û cihê xwe biguherînin. Dema zivistan tê vedigerin deştê jî vê carê rastî zextên gundî û welatiyên bi cih bûne tên. Ji bo bikarin li cihekî konên xwe vegrin û zivistanê li wir derbas bikin pereyekî zêde didin gundiyan. Koçer hem rastî zext û astengiyên dewletê tên, hem jî rastî astengiya gundiyan tên. Di nav vê zahmetiyê de ew jî hewl didin jiyana xwe bidomînin. Li Şirnexê koçerên ku di demsala biharê de diçin zozanên Kato Jîrkî, Kato Marînos, Feraşîn û Kela Memê bi demsala payîzê re vegeriyan deştê û ji bo derbaskirina zivistanê konên xwe vegirtine.

Li navçeya Hezexê ya Şirnexê jî koçerên ku li zozanên Kato Jîrkî, Kato Marînos,Feraşîn û Kela Memê bûn bi hatina demsala payîzê re vegeriyan deştê. Koçerên ku li gundê Arbo ya Hezexê di bin kontarê çiyayê Bagoke de konên xwe vêgirtinê dê demsala zivistanê li vir derbas bikin.

Sudoku: Bersiv 19

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 8 | 2 | 7 | 3 | 6 | 4 | 9 | 5 |
| 3 | 4 | 9 | 5 | 8 | 2 | 7 | 1 | 6 |
| 7 | 6 | 5 | 4 | 1 | 9 | 8 | 3 | 2 |
| 6 | 5 | 4 | 3 | 7 | 1 | 2 | 8 | 9 |
| 8 | 9 | 7 | 6 | 2 | 5 | 3 | 4 | 1 |
| 2 | 3 | 1 | 8 | 9 | 4 | 6 | 5 | 7 |
| 5 | 7 | 6 | 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 8 |
| 4 | 2 | 8 | 1 | 5 | 7 | 9 | 6 | 3 |
| 9 | 1 | 3 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 4 |

Sudoku:Pirs 20

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 4 | | | | 6 | | 9 |
| | | 8 | 9 | | | | | 1 |
| 5 | | | 8 | 1 | 2 | 3 | | 7 |
| | 3 | | | 2 | 7 | | | |
| | | | | 4 | | | | |
| | | | 6 | 8 | | | 2 | |
| 4 | | 3 | 1 | 7 | 6 | | | 2 |
| 2 | | | | | 5 | 1 | | |
| 9 | | 1 | | | | 4 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Çermê serê min diqdiqand:**
- Di serê min de kir pitepit; ji ber axaftina wî serê min êşiya; bû belaya serê min.

**Çermê serê min xwar:**
- Bi heman wateyê.

**Darê xwe ji kunsêwê dernayne:**
- Li belayê digere; ew bi destê xwe pirsgirêkan ji xwe re dertîne.

**Dema ecelê bizinê tê diçe nanê şivên dixwe:**
- Li belayê digere; ji xwe re nasekine; har bûye.

**Dema lêdana bizinê tê diçe nanê şivên dixwe:**
- Bi heman wateyê.

**Destbela ye:**
- Belakir e; li belayê digere; bipirsgirêk e.

**Destê xwe ji pêsîra me venake:**
- Belaya xwe ji me venake; bi ser me de tê.

**Destê xwe xistiye qirika me:**
- Bi heman wateyê.

**Dirriya dêm e:**
- Belakir e; rûyê wî qayîm e; belaya xwe ji mirov venake; cira wî pir ne xweş e.

**Di nava çavên wan de ye:**
- Bûye belaya serê wan; wan dixe **tingiyê; ji wan re bûye pirsgirêk:**

Dîfa xwe dixe bin wan:
- Pirsgirêkan ji wan re çêdike; belaya xwe ji wan venake; wisa dike ku bi hev bikevin.

**Ew jî bo dohnê helîseyê derket pêşiya me:**
- Ew jî bû pirsgirêkeke din.

**Ew jî dohnê helîseyê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Ez çiqas ji belayê direvim, ew tê li lingê min diale:**
- Ez ji pirsgirêkan direvim, lê ew tên min dibînin.

**Gêre anî serê wî:**
- Di nava pirsgirêkan de hişt.

**Ji ber daye qaqa reş:**
- Jê re bûye pirsgirêkeke mezin; nikare xwe jê rizgar bike; bûye bela ketiye stûyê wî.

**Ji destê wî pir dikişînin:**
- Xwedîpirsgirêk e; pirsgirêkan dertîne.

**Ket pêsîra min:**
- Bû bela; belaya xwe ji min venekir; ji min venebû; pirsgirêk ji min re derxistin.

**Ket pirika wî:**
- Ket belaya wî.

**Ketiye daweta cinan:**
- Rastî kesên belakir hatiye.

**Ketiye kirrê min:**
- Belaya xwe li min dide; min hêrs dike.

**Kortika kerengan e:**
- Jê xilas nabin.
(Çiqas kereng bê rakirin jî rayên wê naqelin)

**Kumê xwe ji belayê re hildiavêje:**
- Belakir e; pirsgirêkan dertîne; nesekinî ye; şerê her kesî dike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li cîhanê belav dibe



Endama Rêveber a Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Apo Nûha Umer diyar kir ku Pêngava Cîhanî ya ku di 10'ê Cotmeha 2023'an de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hate destpêkirin, di sala 2024'an li ser asta cîhanî bandoreke mezin kir û deng veda.**R-4**

## Şehîd Cîhan Bilgîn: Em ê heta dawiyê şopdarên rastiyê bin



Nûçegihana ANHA'yê Cîhan Bilgîn beriya ku şehîd bibe diyar kirbû ku ew rewşa herêmê ji nêz ve dişopîne û ew ê heta dawiyê şopdarên rastiyê bin û wiha gotibû: "Hêza çeteyên dewleta Tirk ya dagirker nemaye, ew nikarin berxwe bidin."**R-5**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1232 | 22-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Mala Jin ji pirsgirêkên jin û civakê re dibe bersiv



Berdevka Mala Jin a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rîma Mehmûd diyar kir ku Mala jinê bi hemû derfetên xwe ji bo xizmeta civakê kar û xebatê dide meşandin û wiha got: "Armanca me birêxistinkirina civakê û vejînkirina rihê demokratiyê di malbatê de ye."**R-2**

## 'Wênesazî aramiyê dide kesayeta mirov'



Wênesaza jin Malva Cuma diyar kir ku ew û wênesaziyê bi hev re mezin bûne, wênesazî ji bo wê cîhaneke cûdaye ji ber ku aramî û dilxweşiyê dide kesayeta wê.**R-7**




**Têkçûna Eseed û siberoj**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# EM Ê HER TIM GIRÊDAYÎ DOZA NAZIM Û CÎHAN BIN

Di demeke ku hemû cîhan li ser avakirina sîstemek nû ya li Sûriyê ku hemû pêkhate tê de werin temsîlkirin nîqaş dikin, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê êrişên xwe yên qirkirinê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde dikin. Ji ber ku Çapemeniya Azad hewl dide vê rastiyê ji cîhanê re ragihîne, dibe hedefa dagirkeriya Tirk. Herî dawiyê di encama êrişeke hovane ya dewleta Tirk a dagirker de rojnamevan Nazim Daştan û nûçegihana Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) Cîhan Bilgîn şehîd bûn. Tevî hemû berdêlên giranbiha jî, têkoşîna Çapemeniya Azad di rêwîtiya xwe ya heqîqetê û eşkerekirina rastiyan de bi biryardariyeke mezin berdewam e.**R-5**













## 'Rêxistinên navnetewî hîn tu destek nedane koçberan'

Ibrahîm Şêxo da zanîn ku rêxistinên mafên mirovan, li hemberî sûcên ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li herêmên dagirkirî dike, çavên xwe digrin. Herwiha Şêxo anî ser ziman ku niha 85 hezar koçberên Efrîn û Şehbayê hewcedarî alîkariyê ne û got, 'Heta niha rêxistinên mafê mirovan tu alîkarî ji koçberan re pêşkêş nekirine.'**R-6**

# Mala Jin ji pirsgirêkên jin û civakê re dibe bersiv

Berdevka Mala Jin a herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rîma Mehmûd diyar kir ku Mala jinê bi hemû derfetên xwe ji bo xizmeta civakê kar û xebatê dide meşandin û wiha got: “Armanca me birêxistinkirina civakê û vejînkirina rihê demokratiyê di malbatê de ye.”

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Mala Jin cara yekemîn di 20’ê Adara 2011’an de li Qamişlo wek saziyeke civakî hat avakirin. Di çarçoveya paradîgmaya demokratîk, ekolojîk, azadîparêziya jin de xwe bi rêxistin kiriye û hewl dide rêgezên edaleta civakî pêk bîne, di heman demê de gelek pirsgirêkên civakî yên wekî tundî, zewicandina zarokan, hevberdan, mîrate û hwd çareser dike. Mala Jin hewl dide pirsgirêkan qonax bi qonax çareser bike; li her du aliyan û şahidan guhdarî dike, nîqaş dike û dûre jî çareser dike. Pirsgirêkên ku di qonaxa 4’an de jî nayên çareserkirin, sewqî Dîwana Edaletê ya Jin dike. Mala Jin di sala 2024’an de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê 6 hezar û 500 semîner û komcivîn lidar xistin. Di heman demê de 40 perwerde jî hatin vekirin, ji wan15 perwerdeyên girtî bûn û 25 perwerdeyên vekirî bûn. Her wiha sardana 8 hezar û 740 malbatî kiriye.

### Dozên jinan ku Mala Jin jê re bûye bersiv

Di sala 2024’an de, gelek jinan ji bo çareserkirina dozên xwe berê xwe dane Mala Jin û ev doz wiha ne:

- Jimara dozên pirjinî 124, ji wan 26 hatin çareserkirin, 6 ji bo saziyên din hatin şandin û 145 doz jî ji bo dîwanan edaletê hat rêkirin.
- Jimara dozên zewaca temen biçûk 112, ji wan 72 hatin çareserkirin, 9 doz dewam dikin û 31 doz jî soqî dîwana edalaetê bûn.
- Jimara dozên tundî û işkenceyê 44 doz bûn, ji wan 33 hatin çareserkirin, 21 doz ji bo saziyên din hatin şandin û 90 doz jî soqî dîwana edaletê hat kirin.
- Jimara dozên xwekuştina jinan 5 doz bûn û sewqî dîwana edaletê hatin kirin.
- Jimara dozên destdirêjiyê 2 doz bûn û hedu jî sewqî dîwana edaletê hatin kirin.
- Jimara dozên kuştinê 31 doz bûn û bi giştî sewqî dîwana edaletê hatin kirin.

Bi giştî hijmara dozan 471 doz bûn, ji wan 131 çareser bûn, 9 hîn berdewamin, 304 ji wan ji bo dadgehê hatin şandin û 27 derbasî saziyên cûda bûn.

Di derbarê kar û xebatên Mala Jin yên sala 2024’an li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, berdevka Mala Jin Rîma Mehmûd ji Rojnameya me re axivî.



### Kar û xebatên mala jin di sala 2024’an de

Rîma Mehmûd diyar kir ku Mala Jin li gorî derfetên xwe herdem hewil dide ku ji bo jin û tevahiya civakê bibe cihê çareserkirina pirsgirêkan û wiha domand: “Em di nav şoreşekê de ne, ew şoreş jî bi şoreşa jinê tê naskirin. Di vê şoreşê de jî bi hezaran cûreyên pirsgirêkan di ser me re derbas bûn. Lê hertim çareseriya wan jî hebû, ji ber vê yekê kar û xebatên ku Mala Jin li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê kiriye, karekî pîroz e. Wek mala jin di hundirê hevpeymana civakî de binavê hemû tevgerên jinê ye. Gelek nakokiyên malbatî jî dihatin cem mala jin, ev nakokî ji aliyê aborî, reşkirina navê jinê li ser malperan, zexta malbata jinê, zexta mala xezûr, ev nakokî dighiştin berdanê di navbera jin û mêr de. Lê dema ev nakokî dighê me em ji wan re çareseriyê dibînin. Zewaca temenê piçûk ji destpêka şoreşa 19’ê Tîrmehê ve û heya sala 2018’an de jî pir bû, ji ber ku wê demê tirsa malbatê hebû ku wê keçên wan bikeve destê çeteyên DAIŞ’ê de, lewma ew di temenekî biçûk de dizewicandin. Lê heger wan nedikarî keçên xwe biparêzin mala jin li wan xwedî derdiket û ew diparastin. Pirî caran ew keça 15 salî dema dizewicî û dibû dayîka zarokekî carek din li mala bavê xwe vedgeriya, ji ber ku barê zewacê gelek giran bû ji bo wê. Piştî ku ev bûyer çêdibû êdî malatê berê keça xwe dida mala jin da ku xwedî li mafê wê derkeve. Mala jin ev malbat perwerde dikir ku encama zewace temen piçûk ev e. Lê piştî 2018’an de, civak ket wê ferqê de ku nema çarenûsa keça xwe di temenekî piçûk de xira bike. Di heman demê de qomîta işkenceyê heye ew qomîte ji Kongira Star, Mala Jin, komîta lihevanînê, desteya jin û Rêxistina Sara pêk tê. Dema pirsgirêkek giran be û gefên kuştinê hebin, ev komîte dicive û biryarek tê girtin. Ev biryar mafê tu kesî naxwe û hemû alî razî ne. Erkê me ew e ku em hezkirin û pevgirêdanekî di nava malbatê de çêbikin. Her wiha li ser tundiyê me semînerên diyalokî, birûşûr û komcivîn lidarxistin.”



### Çalakiyên ku di sala 2024’an de hatine lidarxistin

Rîma Mehmûd da zanîn ku îsal mala jin gelek kar û guhertinên pîroz kirin û wiha got: “Semînerên diyalokî li ser azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, li ser 8’ê Adarê, li ser Şehadeta heval Sara û Bêrîtan hatin dayîn. Bi giştî 55 semînerên diyalokî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin çêkirin. Li asta Bakur û Rojhilatî Sûriyê civînên ku mala jinê li darxistin 1000 civîn bûn, him di milê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de, him jî ji bo kar û xebatên jinê bû. Îsal bi dehan keç rastî pirsgirêkên revandinê hatin. Ev yek encama hezkirina keç û xort ji hev re bû, dema xort çend caran tê wê dixwaze malbat nade, êdî revandin çêdibe. Dema revandin çêdibû hêzên ewlekariya hundirîn mudaxeleyê dikin û jin tanîn ji me re. Piştî wê em bi erkê xwe radibin û pirsgirêkê bi rêyên guncaw çareser dikin. Her wiha em di nav şoreşekî de ne ev şoreş hemû gelê Sûriyê cihê xwe di Bakur û Rojhilatê Sûrî de girt. Loma tevlîbûnek çêbûye, hemû pêkhate tevlî hev bûne. Zihniyet gelekî bandor li ser civakê kir, ji ber vê yekê gelek guhertin di nav civakê de çêbû, him ji aliyên pir bûna anîna jinan, zewaca temenê piçûk, tundiya li ser jinê tê meşandin. Rêber Apo dema Şoreşên cîhanê analîz dike, dibêje; di şoreşên cîhanê de bihezaran jin bûn hedef, lê di şoreşa Rojava de û bi vekirina mala jinê ji 2011’an ve û guhdarkirina wê li hemû pirsgirêkên civakê re gelek pirsgirêk çareser bûn. Bi dehan pirsgirêkên malbatî hebû me bi mehan bi wan re nîqaş dikirin da ku neghêje asta berdanê û ew zarok nebin qurbanî. Çi pirsgirêkek derdikeve di nav civakê de giranin lê cihê çareseriyê jî heye. Gelek jin hebû hewildana kuştinê dikirin lê me dikarî xwe bighînin vê jinê û sedema vê yekê nas bikin, me pêre nîqaş dikir encama vê yekê derdiket zexta malbatê bi mehan em diketin nîqaşan de bi malbatê re heya ku me çareser dikir. Loma hebûba mala jinê di nav civakê de gaveke gelekî serkeftî bû.”

### Tundiya li ser jinê

Rîma mehmûd axaftinên xwe berdewam kirin û wiha got: “Di hundirê malê de jin rastî tundiyê tê, sedema wê jî îxaneta mêr ji jinê re ye. Her wiha di milê aborî de dema jin hewcedarî hin tişta dibe û mêr bi erkê xwe ranabe, pirsgirêk derdikeve. Di heman demê de gelek mêr hene madeyên hişbir bikar tînin û li dijî hevjîna xwe tundiyê dike. Bi sedan çîrokên bi vî awayî gihan nav destên me, dema mijar lêdan be ev yek dighêje dadgehê û ew mêr tê girtin heya ku jin qebûl neke ku derkeve dadgeh tu biryara di derheqê wî de nade. Ev 2 salin Zagona malbatê derketiye, mala jin bi hezaran semîner û civîn ji bo danasîna vê zagonê çêkirin û sardana malbatan kiriye. Dema ev zagon ji malbatê re tê xwendin, guhertineke berbiçav çêdibe û ev malbat dibe malbatek demokratî. Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûrî li 8 hezar malbat, zagonên malbatê hatiye xwendin ji wan re. Civakek ku ev 5 hezar sale rastî tudî, işkence, êş û zehmetiyan hatiye, helbet wê gelek pirsgirêkan re derbas bibe, lê piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê gelek guhertinên berbiçav çêbûne û wekhevî di civakê de çêbûye. Lê hilbet wê pirsgirêk derkevin û kilîta çareseriya van pirsgirêkan li cem mala jinê ye. Mala jinê netenê ji bo parastina mafê jinê ye û binpêkirina mavê mêre, lê belê mala jinê ji bo herdu zayendaye û bi rastiyê re ye. Îro roj bi hezaran mêr hene tên şêwira xwe dikin di çareserkirina pirsgirêkan de, dikevin wê ferqê de ku çiqasî em mafê wan jî diparêzin. Mala jinê di Rojavayê Kurdistanê de bûye mînakek ji hemû dewletên cîhanê re. Lewma ji hemû welatên cîhanê jinên famînîst tên û sardana mala jinê dikin û heya niha jî çendek ji wan di mala jinê de kar dikin, da ku ev wekhevî û kar û xebatên ku em dikin herin li welatê xwe jî pêk bînin.”

### Pirojeyên dema pêş a mala jinê

Berdevka mala jin ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rîma Mehmûd axaftina xwe wiha qedand: “Di dema pêş de wê mala jinê derkevin nav gel û wê li her derî semîner û zagona malbatê bidin. Pêngava hişyarkirina gel wê destpê bike Semîner li ser zagonên mala jinê di nav hêzên leşkerî de werin dayîn, di heman demê de ji bo gel wê civînên berfireh li dar bikevin da ku ew jî zagonên mala jinê nasbikin. 8’ê Adarê jî li pêşiya me ye wê ji bo wê jî pilansaziyên me hebin. Her wiha di meha Cotmehê de perwerdeyek li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dar ket, ev perwerde herêma cizîrê girt dest bi tevlîbûna 45 kesan ev perwerde girtî bû 15 rojan bi zimanê kurdî bû û 15 rojan bi zimanê erebî bû. 4 rojan zagonên jin, malbat, lihevaîn û wekheviyê hat dayîn. Heman perwerde wê di dema pêş de li Reqa, Tebqan, Şehba, Heleb û Minbic jî were li darxistin.”



# Ji çiraxên wêjeya kurdî

**Can Yûsif**

Helbestvan Leyla Reşo Kaniya nazikbûn û deryaya peyvên germ. Afirînerî tu carî bi mêran re sînordar nebûye, afirîneriya jinê bi dehsalan hebûna xwe ispat kiriye ku dengê xwe heya deverên dûr belav kiriye, da ku tiştên ku ew diafirîne bibe mînakek wêjeya balkêş ku di wêjeya kurdî de cih û roberek girîng girtiye.

Gelek nivîskarên jin ên kurd ên afirîner hene ku afrînerî kirine û nivîsandine, serpêhatiya wan a afirîneriyê bala gelek mirovan kişandine ser xwe, her wiha serpêhatiyên nivîskarên jin ên kurd ên afirîner ên ji nifşên cuda hene, hin ji wan jiyana xwe ji dest dane û berhemên xwe di destê xwendevanan de hiştine da ku ezmûneke dewlemend nîşan bidin û hin ji wan hîn jî bi tiliyên xwe yên zêrîn wêjeyê dinivîsînin ku ne kêmtirî ji wêjeya mêran e.

Gelek nivîskar û helbestvanên jin ên kurd bi nivîsên xwe xwestine ku jin bindestiya desthilatdariya mêran nepejirîne, cudabûn hebû di pêşkêşkirina mijarên netewî di navbera helbest, edebiyat û romanê de û her wiha di pêşkêşkirina mijarên cuda de ku ji malbatê û nakokiyên di navbera zayendan ji aliyekî ve û li aliyê din jî di navbera jin û kevneşopiyên civakê yên kevnare de.

Di nav jinên ku karîn navên mezin di cîhana çand û wêjeyê de bi dest bixin û navên xwe li navgînên çandî û wêjeyî yên Rojavayê Kurdistanê ferz bikin, helbestvan Leyla Reşo yek ji wa ye ku stêrka wê di asîmanê wêje û çanda kurdî de di vê qonaxa niha de şewq daye û kariye hebûna xwe di nav civaka wêjeya kurdî de bi zîrekî ispat bike.



Helbestvan û nivîskara kurd Leyla Reşo di sala 1979’an de li bajarê Hisîçayê ji dayîk û bavên kurd (Îbrahîm û Bedîa) hatiye dinya yê û di malbateke kurdperwer a welatparêz de, mişt bi ruhê welatparêzî û nirxên Kurdewarî, ku bi hesreta azadiyê û hezkirina wêje û hunerê mezin bûye. Dibistana seretayî, amadeyî û lîse li bajarê Hesekê xwendiye û piştî wergirtina bawernameya amedeyî, wê xwe li kulîjeya perwerdeyê tomar kiriye û ji ber zextên siyasî û dûrxistina wê ji zanîngehê, xwendina xwe ya zanîngehê temam nekiriye. Meyla wê ya ji bo wêjeyê û hezkirina wê ya ji bo nivîsandina helbest, kurteçîrok û wênekêşiyê di temenê xwe yê biçûk de, dema ku di dibistana seretayî de bû, dest pê kiriye,

Wê hewesa xwe ya wênekêşiyê berdewam kir û di qonaxa seretayî de beşdarî gelek pêşangehên dibistanan bûye, û wêneyên (rismên) wê bawernameyên pesindan û rêzgirtinê wergirtine û ji hêla mamosteyan, xwendekar û beşdaran ve hatine heskirin, paşê dest bi nivîsandina kurteçîrokan kiriye û çîroka wê ya yekem bi navê (Senyor û Senyorîta) bû. Ji zarokatiya xwe de ji aliyê bavê xwe yê helbestvan Îbrahîm Reşo (Şevgîr) ve fêrî prensîbên azadî û ramana neteweyî ya kurdî bûye, di qonaxa amadekariyê de, ew ji bavê xwe fêrî nivîsandina zimanê kurdî û rêzimana wê bûye, herwiha wî ew teşwîq û arasteyî xwefêrkirin û xwendina berhemên helbestvan û nivîskarên kurd kiriye, yên wekî helbestvanê kurd (Ehmedê Xanî, Melayê Cezîrî, Cegerxwîn, Tîrêj û helbestvanên kurd ên din).

Piştî ku dest bi dibistana navîn kir, wê xwendina wan efrandinên wêjeyî û çandî yên kurdî berdewam kiriye digel hevsengiya xwendina helbestên bi zimanê erebî bi evîn û hezkirin wekî (helbesta Endelusî, helbesta pinaberiyê ya bi hesret, bêrîkirin û hizirên wê, mu’ellaqat û helbestên Ebû Temam, El-Buhturî, û pêşengên din yên helbesta Erebî) Piştî çend salan ji xwefêrkirin, lêkolîn û xwendinê, wê rezerveke (mexzûn) wêjeyî û çandî bi dest xistiye û hunera xwe ya wêjeyî û çandî hîn zêdetir û bêtir kiriye û xwe fêrî şêwaza nivîsandina her cure yên helbestên (kevneşop, nûjen û pexşan) û kurteçîrokan kiriye bi zimanê kurdî.

Bavê wê, helbestvanê nemir Şevgîr, rola herî mezin û sereke di avkirina kesayetiya wê ya edebî de û xurtkirina hunera wê ya helbestî û dildariya wê ya ji bo nivîsandinê lehîstiye, heya ku têkiliya wê bi helbestê re bûye mîna têkiliya cotkar a bi axê re û têkiliya doktor bi nexweş re, heya ku di navbera wê û helbestê de bûye mîna nêzîkbûna ruh û xwînê û helbest jê re bûye sîwana jiyan û afirandinê, zimanê şahî û xemgîniyê û hawara evîn û êşê, ji ber ku ew di wê baweriyê de ye ku helbestvan berdevkê gelê xwe ye,êş, azar û daxwazên gelê xwe vedibêje, ji ber vê yekê heskirin û evîndariya wê ya ji bo helbestê zêde dibe, lewma di nivîsandina helbestê de riya bavê xwe dişopîne û ew helbestê ji her cure yên hunerê hildibijêre.

Helbestvan Leyla Reşo di 14.11.2000 de bi muzîkjen û bestekarê Kurd Ebdul Selam Gênco re zewicîye û dayîka sê zarokane (du keç û yek kur) e.

Di nav kar û berhemên wê yên wêjeyî (edebî)de sê dîwanên wê yên helbestan ên bi zimanê kurdî hatine çapkirin hene:

1-Tava Hêviyan
2-Lale û Peyal
3- Xeyalên reswa

Ya çaremîn li ber çapê ye binavê (Înana)

Û herwiha pirtûkek li ser çend destan û efsaneyên kurdî jî. Piraniya nivîs û berhemên wê yên edebî helbestên şîretkirin û perwerdeyê ne, ji ber ku ew mamosteya ziman û wêjeya kurdî ye. Wê li ser bedewiya xwezaya Kurdistanê û çiyayên wê, li ser nirxên şehîd û lehengên azadiyê û li ser rol û bedewiya jinên Kurd gelek helbest nivîsandine.

Wê helbestên sofîtî, yên klasîk û yên nûjen, û helbestên pesin, lome û rexne nivîsandine. Di helbestên wê de mijarên civakî, pabendbûna bi pirsgirêkên gelê Kurd re, kultur û şaristaniya wî, bilindkirina nirxên netewî û têkoşîna li dijî dagirkeriyê û guhertina demografîk ku li herêmên dagirkirî yên Kurdistanê pêk tên, di helbestên wê de têne vegotin .Dem bi dem, ew çend nimûneyên xweş ji helbestên helbestvanên kurd yan ereb werdigerîne zimanê kurdî û hin ji nivîsên doktor û rexnegir bi erebî Xalid Husên û helbestvana Cezayîrî Hûriya Omran werdigerîne zimanê kurdî.

Gelek helbestên wê di malper û kovarên wêjeyî de hatin weşandin û gelek spasnameyên rêzgirtin û afirîneriyê wergirtine, hin helbestên wê ji aliyê helbestvanê kurd ê navdar “Guney Ozdemîr” ve bi şêweyek xweş hatin gotin û li ser hin malperên civakî hatine belavkirin.Di dawiyê de mirov dikare bibêje ku helbest ji bo wê zimanê giyan û dil e, navgîna derbirîna bedewî, xemgînî, şahî û hêrsê ye, ew hunerek e ku ji dem û waran derbas dibe, di dilê mirovan de dimîne, hişmendî û teşwîqkirina hizir û ramane.

Ji bo wê, helbest ne tenê gotinek derbasbûyî bû ku mirov bibêje, ew bi serê xwe cîhanek bû, ku tê de hestên xwe vedibêje û di peyvên xwe de mîna ku tu heman kêliyê bijî; ew amûreke handanê ye û enerjiya hêviyê ye, pendin jê tên fêrkirin, exlaqe ku tê pesnandin, awazeke muzîkê ye ku guh pê şa dibe û dil pê xweş dibe,hevsenge ne têkbire, kêfxweşe ne bêzar e. Helbestvan Leyla bi pênûsa ku ji afirînerîyê dibiriqîne, vedihûne tîpên bedew û peyvên hêja û nazik, zelal wek dilopên xunavê, ku tijî ji hestên rasteqîn, tîpên wê rewanan şa dikin û birînan sax dikin.

# ‘Wênesazî aramiyê dide kesayeta mirov’

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

**Wênesaza jin Malva Cuma diyar kir ku ew û wênesaziyê bi hev re mezin bûne, wênesazî ji bo wê cîhaneke cûdaye ji ber ku aramî û dilxweşiyê dide kesayeta wê.**

Malva Cuma di 27’ê Mijdara sala 2004’an de li bajarê Qamişlo jidayîk bûye, zarokatî û xwendina xwe li bajarê Qamişlo derbas kiriye. Niha jî li zanîngeha Qurtûba beşê darayî dixwîne. Ji sala 2019’an ve tevlî navenda Malva ya Hunerê bû û li wir dest bi naskirina xetên zirav yê wênesaziyê kir û ew navend bû mala wê ya duyemîn.

Di derbarê jiyan û astengiyên ku rastî wênesaza jin Malva Cûma hatine ji Rojnameya me re axivî.

### Kurtejiyana Malva Cuma

Malva Cuma da zanîn ku ew û wênesazî bi hev re mezin bûne û wiha got: “Hezkirina min ji wênesaziyê re ji zarokatiyê dest pêkir, her cara ku min tablo xêz dikirin malbata min destek û moral dida min ku ez bi kelecaneke xurtir xêz bikim. Ev yek kesayeta min xurt kir ku ez vê riyê berdewam bikin. Hertim di dibistanê de jî mamosteyên min ji min re digotin ku wêneyên te cûda ne û vê yekê hêviyek nû bi min re avadikir. Di sala 2019’an de ez tevlî navenda Malva ya Hunerê bûm, min zêde nedikarî herim ji ber xwendina min a zanîngehê hebû, lê tevî vê yekê jî min hewil dida tevlî bibim. Li wir astên wênesaziyê hene, heya asta dawî bawernameyê werdigre, lê ji ber ku xwendina min hebû hîn min bawername negirtiye. Di navenda Malva de ne tenê wênesazî heye, di heman demê de ofîs, stodiyo û şevbuhêrik jî li wir hene. Ji ber vê yekê rehetiya ku me li wir didît weke ku me li mala xwe ne. Destpêkê min bê armanc wêne xêzdikirin û ez tevlî tu festîvalan jî nedibûm, lê bi demê re min hîs kir ku mirov bi riya tabloyên xwe re dikare gelek peyaman bighîne derdorê. Êdî piştî wê min biryar da ku ez di demên pêş de tabloyên xwe rengê kurdîtiyê bidim pêş. Ji tevlî wênexêziyê ez tevlî girûpekî bûm me nivîsên wêjeyî û pesindanê dinivîsandin. Di heman demê de li akademiya Edvans jî min zarok fêrî wênexêziyê dikirin, lê ev yek gelekî berdewam nekir ji ber ku ev nanendeke havînî bû dema dibistan vebûn bidawî bû.”

### ‘Ji bo her tiştî ked pêwîste’

wênesaza jin Malva Cuma axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: “Destpêka ku ez tevlî navenda Malva ya Hunerê bûn, ez gelekî bi nakok bûm min li derdora xwe li tabloyan dinêrî min zehmetiyek didît, ku çawa ez ê wek van tabloyan çêbikin. Lê bi demê re gav bi gav min karî ez vê yekê derbas bikin û gavên pêşde bavêjim. Li wir destpêkê ez fêrbûm bi risas xêzbikim paşê bi rengan niha jî bi fehmê wêneyan xêz dikim. Her tabloyek bi hêsanî nayê çêkirin kedeke mezin ji mirov tê xwestin, lê dema mirov ji tiştekê hez bike û xwedî îrade be wê helbet vê yekê derbas bike û bigavên serkeftî jî. Di navenda Malva de mamoste û hevalên min gelek destek û coş dan min bi saya wan îro roj ez tabloyên xwe bi heyecaneke mezin xêz dikim. Dema mirov kedeke mezin bide û encamê wê kedê bibîne hemû astengiyan jibîr dike.”



# ‘Rêxistinên navnetewî hîn tu destek nedane koçberan’

Ibrahîm Şêxo da zanîn ku rêxistinên mafên mirovan, li hemberî sûcên ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li herêmên dagirkirî dike, çavên xwe digrin. Herwiha Şêxo anî ser ziman ku niha 85 hezar koçberên Efrîn û Şehbayê hewcedarî alîkaryê ne û got, ‘Heta niha rêxistinên mafê mirovan tu alîkarî ji koçberan re pêşkêş nekirine.’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Gef, êriş û binpêkirinên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li seranserî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tûndî tên domandin. Herwih gelek komkujî li gel bêdengiya hêzên navnetewî çêdibin. Derbarê heman mijarê de, Rêveberê Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, Iberahîm Şêxo bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Di dema heyî de li gorî şopandina we ji binpêkirinên ku li herêmên dagirkirî (Efrîn, Şehba, Minbicê û tevahiya herêmên dagirkirî çêdibin hûn çawa dinirxînin?**

Piştî êrişa dewleta Tirk û komên çete li ser Şehba di 2’yê Berfanbarê de ku di encamê de hat dagirkirin û welatiyên Efrîn û Şehbayê bi darê zorê hatin koçberkirin. Bi heman operasiyonê dagirkeriyê di 8’ê Berfanbarê de êrişî Minbicê kir. Di heman demê de gelek zext û êriş li ser şêniyên resen ên Efrînê, hat kirin û hîna jî ev binpêkirin berdewam in. Li aliyê din jî hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî gef û tehdîdan tên. Dewleta Tirk a dagirker bi buhaneyan êriş dike û dixwaze gelê kurd qir bike. Rêxistin û saziyên navnetewî yên mafê mirovan li hemberî tevahiya kiryarên dijmirovî yên li Efrîn pêk tên, bêdeng in. Rêxistinên mafê mirovan, li hemberî sûcên ku li Şehbayê pêk tên çavên xwe digrin. Pê re jî, ji destpêka dagirkirina Efrînê ve û heta niha sûcên dijmirovî ranewstiyane, komên çete rojane kiryarên kuştin û revandinê di derheqê gelê me li Efrînê û tevahiya herêmên dagirkirî dikin. Eger sazî û rêxistinên navneteweyî xwedî helwest bûna, wê sûcên dijmirovî yên ku di derheqê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de pêk nehatana. Ev yek jî di axaftinên serokê Tirikiyê Erdogan de tê xuyakirin. Erdogan dibêje ku em şerê PKK’ê dikin û ewlehiya sînorê dewleta xwe diparêzin. Eger bêdengî li hember êrişan bidome, em tekez dikin ku ev yek pilaneke ji bo qirkirina gelê kurd e.

**Li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê gef û êrişên dagirkeriyê çêdibin, hem jî komkujî pêk tên mîna komkujiya Ên Îsa, Minbic û komkujiyên ku li Şehbayê pêk hatin, gelo çima rêxistinên mafê mirovan ên cîhanî li hemberî van kiryaran bêdeng in?**

Di dema dawiyê de dagirkeriya Tirk komkujiyek li Ên Îsa pêk anî û di ancamê de malbatek bi temamî hate qetilkirin. Li Til Rifetê jî komên çete weke Emşat û Hemzat êrişî koçberan kirin û komkujiyên qirêj di derheqê wan de çêkirin. Li Minbicê jî gelek ciwanên me bi hovîtî li ser destê heman komên çete şehîd bûn. Em dibînin ku asta van kiryarên binpêkirinê pir bilind bûye, ev yek jî, ji ber ku hêzên navnetewî û rêxistinên mafê mirovan ên cîhanî li hemberî dagirkeriyê bêhelwest in. Hêzên navneteweyî heta niha bi erkê xwe ranebûne. Ji bêdengiya hêzên navnetewî di serî de Amerîka tê xuyakirin ku ew naxwazin têkilî û berjewendiyên xwe bi dagirkeriya Tirk re xira bikin. Di encamê de gelên Sûriyê dibin qurbaniyên şerê dagirkeriya tirk û çeteyên wê. Me weke Rêxistina Mafê Mirovan, bang li tevahiya hêzên navnetewî kir ku pêwîste binpêkirinên ku ji hêla dagirkeriya Tirk û komên çete ve tên kirin rawestin. Herwiha me destnîşan kir ku rapor û belgeyên binpêkirinan di destê rêxistinên cîhanî de ne, lewma jî pêwîste hemû kesên sûcdar werin cezakirin. Lê heta niha tu tevgera rêxistin û saziyên navnetewî ji bo bidawîkirina kiryarên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê, çênebûye. Hêzên Hevpeymaniya Navnetewî hîna gav li hemberî gef û êrişan neavêtiye, lê hêviya me ew e ku wê hin gav bên avêtin.

**Di dema heyî de bi hezaran koçber dûrî warê xwe ketine, rewşa wan çi ye, rêxistinên mafê mirovan ên cîhanî tu destek dane wan û we heta çi radeyê rewşa wan ji bo cîhanê daye diyarkirin?**

Em dizain ku zêdeyî 85 hezar kes ji herêma Şehba hatin koçberkirin. Herwiha tevahiya koçberan li Tebqa, Reqa, Qamişlo û hemû herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cih bûn. Piraniya van koçberan, jin û zarok in,



niha di zor û zehmetiyan re derbas dibin. Em niha di demsala zivistanî de ne, sermayeke zêde heye û barê koçberan giran e. Di heman demê de pêwîstiya wan bi pêdiviyên sereke hene, bi taybet zarok mîna şîr û tevahiya tiştên girîng. Lê heta niha rêxistinên mafê mirovan ên cîhanî destek nedane van koçberan. Yên ku alîkariyê ji koçberan re pêşkêş dikin tenê Rêveberiya Xweser, gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û rêxistinên xwecihî ne. Ev alîkariya ku tê ji koçberan re jî, li gorî hejmara koçberan, ne di asta tê xwestin de ye. Hin saziyên navnetewî bi me re têkilî kirin weke Komîteya lêpirsîna Navnetewî, me jî kiriyarên ku di derheqê kerwanên koçberan de hatin kirin, rewşa koçberan û hejmara wan işkere kirin. Lê heta niha tiştek li ser ruyê erdê pêk nehatiye. Lewma jî em bang dikin ku rêxistinên navnetewî bi erkê xwe yê exlaqî û mirovî li hemberî koçberan rabin û destekê bidin wan. Li aliyekî din divê sazî û rêxistinên mafê mirovan ên cîhanî li hemberî kiryarên dagirkeriya Tirk û komên çete yên ku bûne sersebebê ku welatiyên Efrînê du caran koçber bibin, rawestin.

## Têkçûna Eseed û siberoj



Hafiz Ahmet Turhalli

Rejîma Baas ya Sûriye piştî dehê salan têkçu. Rejîmên Baas weke Nîjadperestên Ereban xwe di Erdnîgariya Kurdistanê de bicîh kirin, gelek tiştên nelirê pêkanîn û zilmekî mezin li ser gelan dan meşandin. Tirsekî pir giran li ser milletan pêk anîn, kuştin, îşkence, malwêranî û qetilkirin jî rêzêbûn. Gelê Kurd, ji hêla Baas a Iraqê ku serokatiya wê Saddam dikir, bi çekên kîmyewî hate qirkirin, enfal, şewtandin û zilma giran li Kurdan kir û dawiyê hate sêdardekirin.
Ev çend salin Baasa Sûriyê jî heman tişt li serê Kurdan anî, bi muxaberata xwe kurd perçiqandin, mafê wan ê niştecîhbûnê nehate dayîn, Erdnîgariya Kurd bi planekî hov ku navê wî kembera Erebî ye bi darê zorê hate pêşxistin.
Ev çend salin Kurê Eseed, ji bo ku Kurd nebin xwedî statû berxwe da û dawiyê de ewjî têk çû.
Niha dora Nîjadperestê Tirk ku Eslê xwe jî ne Tirke, Erdoganê Gurcîyê… Erdogan bi hilbijêrên Sêrtê bû serokwezîr, bi nanê Kurdan bû xwedan desthelat. Gotinekî me Kurdan heye, dibêjin gelo “Nanê me bê xwê ye!” Kê nane me dixwe, dibe dijminekî har li beramber me. Ev millet milletekî esîlzadeye û xwedan çandekî dîrokî û mirovî ye.
Gelê Kurd di serdema meya îroyinde bûye xwedan serkeftinekî mutleq. Hemû cîhan behsa Kurdan dike, camêrî û egîdiya wan vedibêje.
Erdogan û nîjadperestên Tirk ji bo Rojava tunne bikin diranên xwe diseqînin û êrîşê Milletê me ye bê guneh dikin. Kesên ji Efrîna birîndar hatibûn penaberkirin, ji Til Rifet û Şehbayê carekî din hatin koçberkirin, ev zilma giran ji hêla Erdogan û çeteyên wî ve tê meşandin.
Dewleta Tirk û sîstema wê ji ya Baas a Erebî zêdetir zilm li Kurdan kiriye û dike, ev zilm û hovîtî bi rengên cuda hêjî berdewam dike.
Îskenderê mezin nikaribû bi Kurdên serbilind çok bide şikandin: Çejikê, Cengîzxan û yên Kemal Atatûrk weke Erdoganê tirsonek wê tu demî nikaribin bi Kurdan çok bidin şikandin.
Dîrok xwe carekî din dûbare kir, piştî Saddam, Beşar jî çû! Lê xuyaye zalim û dagirkerên ser xaka me ya pîroz, ji vê dîrokê tiştan fêr nabin û her di cehaleta xwe de berdewam dikin.
Ji bo HTŞ’ê divê henekî bîranîn werin vegotin: Erdogan û dewleta Tirk DAÎŞ sor kir û biser Kurdan ve şand! Kurd bi keç û xortên xwe yê çeleng xwînmijên DAÎŞê têk birin û biser ketin. Divê HTŞ vê dîroka nêz bi bîra xwe bîne û ligor wî sîyasetekî nuh ava bike. Ger weke DAÎŞê gotina Erdogan û sîtema nîjadperesta Tirkan bike, aqîbeta DAÎŞê li benda HTŞ’ê ye.
Erdogan û dewleta Tirk banga aşitiyê ya Kurdan weke qelsiyekî dixwînin. Dibêjin qey Kurd ji wan ditirsin. Gelê Kurd jî her ku diçe hêztir dibe û dostên xwe jî zêdetir dike.
Divê Dewleta Tirk û HTŞ ji Sedam, DAÎŞ û Beşarê kurê Eseed dersan bigrin, an na; heman çarenûs li benda Erdogan û Colanî ye jî.
Ji bo Sûriyekî adil were avakirin, divê di serî de mafê Kurdan û hemû neteweyên dîtir di makezoganê de were çespandin û aşitiyekî mayinde were bicîh kirin.
Ev ji bo berjewendiyên milletên Sûriyê û Rojhelata navîn e.
Ger Erdogan û Colanî di sîyaseta berê de israr bikin, yan dê birevin yan jî dê werin sêdare kirin.

# Şêniyên Qamişlo: Berxwedan misogeriya serkeftinê ye

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Şêniyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku bi hilweşîna rêjîma Eseed rûpeleke nû hat vekirin û pêvajoyeke pir xeternak tê jiyîn. Herwiha şêniyan tekez kirin ku ewê bi berxwedaniyê destkeftî û hebûna xwe biparêzin.**

Ji ber lezbûna bûyeran di van demên dawî de ku li herêmê çêdibe, bi ketina Beşar Eseed û rûxandina rêjîma ku bi salan zilm û zordarî li ser gelê Sûriyê bi giştî û gelê kurd bi taybet hate meşandin. Herwiha piştî hatina HTŞ’ê li ser desthilatdariya Şamê, herwiha dewletek dixwaze berjewndiyên xwe pêk bîne. Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê jî asta êrişên xwe bilindtir kirin û dixwazin herêmê bi giştî dagirk bikin. Çeteyên dagirkeriya Tirk êriş Mibicê kirin û ew dagir kirin. Piştî wê berê xwe dan seda Tişrîn û pira Qereqozaq, lê şervanên QSD û YPJ’ê tevahiya êrişên çeteyan şikandin û derbeyên mezin li çeteyan dan.



Silêman Remê

**‘Ketina rêjîma Eseed derfeteke ji bo avakirina Sûryeke demokratîk e’**

Derbarê rewşa dawî ya Sûriyê û êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê welatiyên bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.
Welatiyê bi navê Silêman Remê diyar kir ku piştî reva Eseed û hilweşandina rêjîma Baas,ji bo kurdan û tevahiya gelên Sûriyê rûpeleke nû hat vekirin û wiha got: “Ji bo me weke kurdan derfeteke ku em maf û azadiya xwe bidest bixin. Bi salan rêjîma Baas îşkence, nijadperestî, zilm û zordarî bi taybet li ser gelê kurd meşand, bi ketina vê rêjîma dictator hêviyên me hene ku em bi aştî li herêmên xwe jiyan bikin bi tevahî pêkhateyên herêmê re bê cudahî. Em naxwazin vegerin weke berî 2011`an bê maf bimînin, di sûriyeyek nû de weke gelê kurd paeçeyeke bin ji Sûriyê”
Silêman Remê ji bo êrîşên dewleta tirk ku li ser herêmê pêk tîne wiha got: Dewleta Tirk dixwaze parçeyên ji sûriyê dagir bike, ev yek çi di riya êrîşêan an jî di riya avakirina fitneyan di navbera gelê herêmê pêk tîne, divê hemû pêkhateyên sûriyê hişyar bin ji vê yekê. Ya herî giring ew e ku em jî li dora hêzên xwe bin, bi hev re parastina xaka xwe bikin, ji ber ku ev erkeke dikeve ser milê hemû şêniyan.”



Ezîze Iskender

**‘Bi hevgirtinê em ê bi serbikevin’**

Ezîze Iskender Hesen ji bajarê Qamişlo destnîşan kir ku êrîşa li dijî gelê me pêk tê hemû netewên di herêmê de jiyan dikin hedef digre û wiha got: “Di vê rewşa heyî ku em tê de jiyan dikin, hewildanên afrandina fitneyê di navbera pêkhatyên Sûriyê, bi taybet li Dêra Zorê û Reqayê herwiha gundewarê wê, ku xuya bû di riya çeteyên dewleta tirk hate kirin, bi armanca derxistina kaosê û qirkirina gelê kurd, herwiha moralê gel bişkînin. Armanca dewleta tirk ku bikaribe di riya van çeteyan dest deyne ser xaka Sûriyê.”
Di dawî de Ezîze Iskender Hesen wiha anî ziman: “Parastina herêmê dikeve ser milê her welatiyek ku di herêmê de jiyan dikin, divê li gel hêzên xwe û yên parastina cewherî taxên xwe biparêzin, heta nefesek di canê me de hebe divê parastina xaka xwe bikin, bi hev re em ê êrîşan têkbibin û sûriyeke azad ava bikin.”



# YRA û YRJ’ê: Em ê pênûs û kameraya şehîdan li erdê nehêlin

Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) û Yekîtiya Ragihandina Jin (YRJ) êrîşa dewleta Tirk a dagirker ku li dijî rojnamevanan pêk hat û di encamê de Nûçegihana ANHA’yê Cîhan Bilgîn û rojnemamevan Nazin Daştan şehîd bûn, bi tundî şermezar kir.

**Navenda Nûçeyan**

Dagirkeriya Tirk careke din êrişê rojnemavanên dengê rastiyê kir. Vê carê jî Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan bûn şehîdê heqîqetê. Derbarê hedefgirtina herdu rojnamevan , YRA û YRJ’ê daxuyaniyek dan.
Daxuyanî wiha ye:
“Ji 8’ê Kanûnê (2024) ve dewleta Tirkiye ya dagirker û komên çete yên girêdayî wê êrişên xwe yên li ser herêmên Bakûr û Rojhilatê Suriyeyê zêde kirine. Di demeke ku hemû cîhan li ser avakirina sîstemek nû ya li Suriyeyê ku hemû pêkhate tê de werin temsîlkirin, nîqaş dikin de, Çapemeniya Azad hewl dide vê rastiyê ji raya giştî re ragihîne.
Hevrêyên me yên rojnamevan, ji bo pêkanîna vê erka xwe ya exlaqî û dirokî, li hemû eniyên ku êriş li ser hene, bê dudilî kar dimeşînin, êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirkiyê ji gel û raya giştî ya cîhanê re radigihînin. Dewleta Tirkiyê bi van êrişên xwe tevahî nirxên civaka me hedef digire, her wiha ragihandina ku rastiya wan aşkera dike jî xisteya pêşiya êrişên xwe. Li gorî hemû peymanên navnetewî mafê rojnamevanan ê şopandina şer û pevçûnan heye û divê neyên hedefgirtin. Lê dewleta Tirkiye li hemberî Çapemeniya Azad şerekî hovane dişemeşîne.
Weke eniyeke bi bandor a têkoşînê, Çapemeniya Azad, di rêwitiya xwe ya heqîqetê û aşkerakirina rastiyan de, bedelên giranbuha dane.
Herî dawiyê di encama êrişeke hovane ya dewleta Tirk a dagirker de du hevalên me yên rojnamevan şehîd bûn. Di vê êrişa nemerdane de hevalên me yên rojnamevan Nazim Daştan û nûçegihana Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) Cîhan Bîlgin şehîd bûn.
Herdu hevalên me ji roja destpêkê ya êrişên ku li ser Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaqê têm domkirin ve, berxwedaniya li herêmê dişopandin. Roja 19’yê Kanûna 2024’an jî dema karê xwe yê rojnamevaniyê dimeşandin, saet di 15:20’an de, li ser rêya di navbera Bendava Tişrîn û bajaroka Sirînê de wesayita wan ji aliyê balefireke bê miro û biçek a dewleta Tirkiyê ve hat bombebarankirin. Di encama êrişê de hedu hevalên me şehîd bûn, ajarokarê wesayîtê Ezîz Hec Bozan jî, birîndar bû.
Hevala me Cîhan Bîlgîn ji sala 2017’an ve li Rojavayê Kurdistanê rojnamevaniyê dike. Heval Cîhan Bîlgîn di malbeteke welatpêrêz a bedeldayî de mezin bûye. Ji bo ku berxwedan û Şoreşa Rojava ji raya giştî re ragihîne, weke rojnamevanek wêrek di eniya herî pêş ya Çapemeniya Azad de cîh girt. Bi pênûs û kamerya xwe, her tim bû zimanê şoreşa gelan û şoreşa jinan. Cîhan Bîlgîn 8 salan di ANHA’yê de weke nûçegihan xebat kir. Di pêvajoya avakirina Şoreşa Rojava de, weke rojnamevanekê 8 salên tije têkoşîn derbas kirin. Di demên ku êrişên dewleta Tirkiyeyê li ser Rojava dijwar dibûn de, ji bo ku rastiyan bi awayekî herî baş ragihîne, her dem li eniya herî pêş bû. Dîsa di pêvajoya avakirina pergala xweseriya demokratîk a li herêmê de weke jineke lêgerinvana azadiyê, bi nûçe, dosya û hevpeyvînên xwe Şoreşa Rojava ku şoreşa jinê ye, ji raya giştî re ragihand. Di rêwitiya domdar a Çapemeniya Azad de, weke şopdara kevneşopiya Gurbetelî Ersoz, Gulistan Tara, Seyîd Evran, Dilîşan Îbiş û bi sedan şehîdên ragihandinê, bi azweriyeke mezin Şoreşa Rojava ji raya giştî ya Kurdistanê û cîhanê re ragihand. Cîhan Bîlgîn bi qasî pirsporiya xwe ya rojnamevaniyê, bi rûkenî û bi hevaltiya xwe jî kesayeteke mînak bû.
Têkoşer û rojnemevan Nazim Daştan, li navçeya Gihadîn a bajarê Agirî yê Bakûrê Kurdistanê hatiye dinê. Di malbateke welatparêz de mezin bûye. Bi vê zanebûna netewî, di temenekî ciwan de, di eniya ragihandinê de dibe lêgerînvan û têkoşerê azadiyê. Sala 2014’an di pêvajoyeke ku êrişên DAIŞ’ê li ser Rojava destpê kirin de,



derbasî Rojava bû. Destpêkê li Efrinê, piştre jî li Kobanê berxwedana dîrokî şopand û ji cîhanê re ragihand. Di pêvajoya berxwedana Rêveberiya Xweser a li Bakûrê Kurdistanê de derbasî navçeya Silopya ya Şirnexê bû û erka rojnamevaniyê li wir domand. Lê dewleta Tirk ji ber karê wî yê rojnamevaniyê, derbarê wî de lêpirsîn da destpêkirin. Tevî zextan jî hevalê Nazim dest ji karê rojnamevaniyê berneda û sala 2016’an careke din derbasî Rojavayê Kurdistanê bû. Di salên dirêj yên têkoşêna rojnamevaniyê de, li Efrîn, Kobanê, Reqa, Girê Spî, Şengal û Başûrê Kurdistanê erka rojnamevaniyê bi layîqî pêk anî. Herî dawiyê jî berxwedana Bendava Tişrînê ya li dijî êrişên dagirkeriyê dişopand.
Hevalê me Nazim bi kesayata xwe ya dilnizm, kedkar û bîrewer di eniya herî pêş ya Çapemeniya Azad de cîh girt. Li her cihekî ku têkoşîna dijwar lê hebû, hevrêyê me Nazim Daştan bi kamera û penûsa xwe li wir bû. Weke şopdarekî Xelîl Dag, bi pênûs û kameraya xwe bûye zimanê heqîqetê. Weke rojnamevanek wêrek di rêwitiya dijwar û demdirêj a çapemeniyê de ji bo gelek sazî û dezgahehên Çapemeniya Azad xebat meşandin.
Weke Çapemeniya Azad em soz û biryardariya xwe ya mezinkirina têkoşîna hevrê Nazim Daştan, Cîhan Bîlgîn û hemû şehîdên ragihandinê nû dikin.”

# Hêzên Ewlekariya Hundirîn misogeriya parastina civakê ye

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Rêveberê Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mihemed Umer diyar kir ku hêzên wan 24’ demjimêran di nava amedekariyê de ne û armanca biryara qedexekirina çûn û hatinê ew e ku rê li pêşiya planên derxistina bê aramiyê di nava civakê de û got, “Civak û hêzên leşkerî ji bo parastina herêmê di nava hevkariyê de ne.”**

Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 8’ê Kanûnê de, qedexeya derketina derve li tevahî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji demjimêr 8’ê êvarê heta 8’ê sibehê, ji ber rewşa awarte ya ku Sûriyê tê re derbas dibe û ji bo parastina ewlekariya hundirîn û da ku li hemberî hemû êrişan heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê were parastin, ragihandibû. Dewreyên ewlehiyê li tevahî bajar, bajarok û gundewarên kantonên Herêmê belav bûne. Piştre ji aliyê Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, giştînameyek derbarê guhartina qedexeyê de derxist û qedexeya derketinê ji demjimêr 5’ê êvarê heta 8’ê sibehê ji 13’ê Kanûnê



ve heta demeke nediyar dest pê kir.
Derbarê biryara qedexekirina kombûn, çûn û hatinê ya ku ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve hatiye derxistin, Rêveberê Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mihemed Umer ji Rojnameya me re axifî.
Mihemed Umer diyar kir ku Hêza Ewlekariya Hundirîn bê navber kar û xebatên xwe yên ewlekariyê dide meşandin û wiha got: “Em weke Hêza Ewlekariya Hundirîn ji nava vê civakê hatine birêxistinkirin, hêza Ewlekariya Hundirîn, civak û hêzên leşkerî ji bo parastina herêm, nirx û destkeftiyên şoreşa 19’ê Tîrmehê di nava hemahengî û hevkariyê de ne. Herwiha em û civak bi hev re erkên ku dikeve ser milê me beşekî bi awayekî herî xurt û astekî herî bilind didin meşandin. Lê belê rola herî girîng di parastina herêmê de ya gelê me ye, ji ber ew xwedî li destkeftî û saziyên xwe derdikevin û ji kiryarên xerab ku li ser wan tê meşandin agehdarin, di heman demê de gelê me rewşên ku jiyan û civakê dixin metirsiyê de, bi me re parve dikin û em jî li gorî wê weke Hêza Ewlekariya Hundirîn dikevin nava tevgerê de û li ser vî bingehî kar tê meşandin.”

**‘Rê li pêşiya planên xerakirinê hate girtin’**

Mihemed Umer di berdewamiya axaftina xwe de eşkerekir ku wan ji bo parastina herêmê tevdîrên xwe girtine û wiha got: “Niha ji bo parastina civak û herêmê, Hêzên Ewlekariya Hundirîn gelek tevdîr girtin, mîna qedexekirina kombûnan, ji ber ev kombûn ji aliyê şaneyên razayî yên çeteyên DAIŞ’ê tê bikaranîn, li gorî wê jî ev şane kar û xebatê xerakirinê li herêmê me pêktînin, lewra biryarekî ku komkirin pêk neyê, hate derxistin. Li kêlek vê jî di nava bajaran de qedexekirina tevgerê ku ji seat 5’ê evarî heyanî 8 sibehê, ew jî li ser bingeha ku rê li pêşiya tevgera şaneyên veşartî bê girtin û ew şane nikaribin xwe komî ser hev bikin, ji bona ku di nava civakê de kiryarên xerakirinê û pirsgirêkan dernexînin. Ji xwe em wek Hêzên Ewlekariya Hundirîn hemû hêzên me di nava hişyariyekê de ne û 24 seatan kar û xebat tê meşandin, dewriye û bendên kontirolê hatine zêdekirin, ev yek ji bo rewşa aramî û ewlekariyê di asta herî jor de ye. Gelek kesên ku xwestin tevlîheviyê pêk bînin, rê li pêşiya planên wan hatin girtin. Ji bo parastina herêmê ne tenê rolekî Hêzên Ewlekariya Hundirîn heye, lê dema gelê me jî li gorî biryaran birêkûpêk tevbigerin, ew jî dibe alîkariyeke mezin ji bona hêzên me yên ewlekariya hindirîn.”

**‘Tevdîrên ewlekariyê wê serkeftinê bi xwe re bîne’**

Mihemed Umer anî ziman ku armanca biryara qedexekirinê parastina herêmê ye û wiha got: “Di dema niha de her kesên ku dixwazin xerakirinê pêk bînin, şerê taybet didin meşandin, lewra divê li hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyê û ev şer were teysandin û civaka me di ferqa vî şerî de be. Gelê me di wê baweriyê deye ku li hemberî şerê taybet û her xerakirinekê, wê tevdîrên me yê ewlekariyê girtine, di dawiyê de encama serkeftinê bigire dest. Biryara qedexekirina çûn û hatinê ya ku derket, armanc jê ewe ku em rê li pêşiya planên qirêj ê ku di nava civakê de dihat kirin an jî şane nikaribin rolekî xerab di nava civakê de bikin. Gelê me di wê baweriyê de ye ku ev biryarên derdikevin ji bo parastina wê ye, ji bo vê yekê di astekî baş de tê pêkanîn.”

**‘Civaka me xwediyê şoreş û destkeftiyê xwe ye’**

Rêveberê Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Mihemed Umer axaftina xwe wiha qedand: “Pêwîste gelê me heyanî dawiyê saziyên xwe hembêz bike û xwedî li destkeftiyên xwe derkeve, herwiha nekevin bin bandoriya şerê taybet ê ku tê meşandin. Li gorî malperê me yê fermî liv û tevgera xwe bike. Me şoreşa xwe heta vê astê bi ked û fedekariya herî mezin, bi dana ewqas cangoriyên ku li ber vê civakê canê xwe feda kirin biserxistiye, herwiha me gelek zehmetî derbas kirin û ji vê zehmetiyê bêtir jî em ê derbas bikin, ji ber civaka me xwediyê şoreş û destkeftiyê xwe ye.”

# Pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li cîhanê belav dibe

Endama Rêveber a Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Apo Nûha Umer diyar kir ku Pêngava Cîhanî ya ku di 10'ê Cotmeha 2023'an de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hate destpêkirin, di sala 2024'an li ser asta cîhanî bandoreke mezin kir û deng veda.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Weke ku tê zanîn ku di 10 Cotmeha 2023'an de Pêngaveke cîhanî ji bo azdiya fîzîk a Rêber Apo re, di bin dûrişmeya "Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî" hate destpêkirin. Destpêkirina vê pêngavê ji 74 navndên cîhanê hate herkandin û berfireh bû.

Di dema niha de jî li zêdeyî 105 navendan derbas kiriye û ji 6 parzemînên cîhanê. Ev pêngav bi çalakiyên pir xurt û renge reng û bi heybet pêş ket, di encamê van çalakiyan de gelek zextên mezin li rêxistinên Ewropî û cîhanî hate kirin.

### Bi hêzeke xurt pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Apo didome

Balkêşbûn û cûdahiya vê pêngavê ji pêngavên beriya wê yên di salên bûrî de, ew e ku ev pêngav bê navber didûme ta bighêje encam û armanca azadiya fîzîkî ya Rêber Apo. Balkêşiya wê ya din jî ew ku kesayetên ev pêngav dane destpêkirin, dostên gelê kurd yên Ewropa yê ku ji kesayetên rewşnbîr, zanyar, feylesûf, xwediyên xelatên nûbilê, hiqûqnas, rêxistinên civaka sivîl, sendîqeyên karkeran ên cîhanî, rêxistin û tevgerên jinan û parstiyên siyasî pêk hat. Herwiha di 14'ê Cotmeha 2023'an hemû sazî, desgeh, şêx, rûsipiyên eşîran, hiqûqnas, dektor û hwd... yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî vê pêngavê bûn.

Di 15'ê Sibata 2024'an de, bi meşeke girseyî ya dostên kurdan li bajarê Kulnê yê Almaniyayê bi daxuyaniyekê ragihandin ku pêngav derbasî asta 2'yem bû û asta çalakiya her bilind bû. Herwiha ji aliyê Insyatîfa Gel li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve kampaniya komkirina îmzeyan ji bo Encûmana Yekîtîya Ewropayê hate kirin, di nava van îmzeyan de gelên Rojava bi hemû pêkhate û rêxistinên xwe yên jin û ciwanan cih girtin, di heman demê de ev îmze hejmara ku hedef girtibû derbas kir û hate encam kirin.

### Derbasbûna Pêngava cîhanî ji sala 2024'an re

Di sala 2024'an de asta çalakiya dehan xurtir bûn. Çalakiyên ku derbarê pêngava cîhanî di sala



2024'an de hate meşandin evin:

-Hemû pîrozbahî û şahiyên sala 2024'an di çarçoveya pêngava cîhanî û di bin dirûşmeya pêngavê de hatin lidarxisin, mîna 8 Adarê, 12 Adarê, Newroza 2024'an û hwd...

-Name ji rêxistinên cîhanî, hiqûqî û tenduristî re hatin rêkirin, da ku bi erkên xwe rabin, rewşa Rêber Apo bişopînin û Rêber Apo bi fîzîkî azad bibe.

-Serdana 33 partiyên siyasî yên Ereb, Suryan, Ermen û Kurdistanî hate kirin, da ku ew jî rola xwe ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo aktîv bikin. Di encama van serdanan de, meclisa civakî ya Ermenî panêlek ji bo azadiya Rêber Apo li dar xist, herwiha partiya Nûjen ya Demokrasî li Sûriyê 2 panêl lidar xist, yek li bajarê Minbic ya din jî li bajarê Şedadê û di van palnêlan de nerîn û pêşinyarên girîng ji bo xurtkirina pêngava cîhanî hatin girtin, ji wan pêşinyaran jî, ji bo 8 welatên mezin ên cîhanî name hatin rêkirin, ji wan Parlemanto, Mecilsa Taxan a Hindistanê, Meclisa Dûma ya Rûsî, kongirêsa Emerîkî, Meclisa Çînê û hwd.... Eynê name ji 23 welatên Rojhilata Navîn re hatin rêkirin, ji bo parlemato û qunsilosên wan, da ku ew jî bikevin tevgerê û xwedî li pêngava azadiya Rêber Apo derkevin.

### Naveroka van nameya jî wiha bû:

1-Balkişandina li ser dîroka Tirkiyê ya ku li ser xwîna mirovan hatiye avakirin, her tim komkujî li ser gelan daye meşandin.

2-Kiryarên dewleta Tirkiyê yên ku li Rojavayê Kurdistanê pêk tîne ku çawa êrişî binesaziya herêmê û gelên sivîl dike.

3-Binpêkirinên ne mirovî û yên li dijî zagon û yasayên cîhanî û zagonên Tirkiyê bixwe di derheqê Rêber Apo di zindana Îmraliyê de pêk tîne, sîstemeke taybet e.

-Serdana şêx û rûsipiyên eşîrên Eraban yên li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di encama van serdana de 49 îmzeyên serokeşîran hatin komkirin. Ji şêxên welatên Ereban bi yek deng û name daxwz û bang li azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hate kirin, herwiha bang li rêxistinên mirovî û cîhanî kirin, da ku aktîv bibin û bi erkên xwe ve rabin.

-Komxebatên hevbeş bi insiyatîfa parêzerên a ji bo parastina Rêber Apo û desteya tenduristiyê hatin lidarxistin, di çarçoveya pêngava cîhanî.

-Têkilî bi kesayetên navdar ên Rojhilata Navîn mîna rewşenbîr, siyasetmedar, hiqûqnas û nivîskar. Di encama van têkiliyan de gelek gotar hatin nivîsandin, herwiha insiyatîfa Amazîxê ya ji bo azadiya Rêber Apo hate avakirin û berdevkeke jin ji endamên insiyatîfa Sûriyê ya azadiya Rêber Apo hate hilbijartin ku weke rûyekî pêngavê di bin navê çanda me nasnameya me ye.

-Gelek komxebat, panêl û cıvîn hatin lidarxistin û daxuyanî hatin weşandin ji bo raya giştî ya cîhanî.

-Meşên mezin li her bajarî hatin lidarxistin.

-Li Bakurê Kurdistanê girtîgehên zindanan ketin giravên birçîbûnê û berxwedaneke mezin dane meşandin, ev yek jî ne cara yekeme di dîroka gelê kurd de. Banga wan ji vê giravê ew bû ku têkoşîna azadiyê neyê seknandin.

-Komên xwendina parazname û pirtûkên Rêber Apo li bajaran hatin avakirin û di encam de her pareznameyek bi dawî dibû komxebatek dihate lidarxistin û nîqaş li ser dihat kirin.

-Gelek kampaniyên ilktironî yên haştagê hatin lidarxistin.

### Di çarçoveya pêngavê de li ser asta Ewropa gelek çalakî hatin lidarxistin ew jî wiha ne:

-69 xwediyên xelatên Nûbilê bi yek deng û nameyî ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, bang li rêxistinên mirovî kirin.

- Ji aliyê parêzerên cîhanî ve kampaniyek komkirina îmzeyan hate dest pê kirin û li ser asta cîhanî ji bo Wîzareta Edaleta Tirkiyê ragihînin ku her parêzer parêzerê Rêber Apo ye.

-Bi hezaran name ji aliyê rêxistinên jinan yên cîhanî, ji bo rêxistinên cîhanî hatin rêkirin.

-500 rêxistinên cîhanî, mirovî û kesayetên bibandor daxwaza azadiya Rêber Apo kirin.

-Meşeke mezin li bajarê Kulnê hate lidarxistin, pira kulênê hejand.

Derbarê encamên pêngava cîhanî ya Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ya sala 2024'an de, endama Rêveber a Insiyatîfa Sûriyê ya Azadiya Rêber Apo Nûha Umer ji rojnameya me re axivî.

Nûha Umer diyar kir ku pêngava cîhanî roleke girîng di asta cîhanê de lîst û wiha got: "Pêngava cîhanî ya ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, roleke girîng û mezin di asta cîhanî de lîst. Di heman demê de pêngav zextên mezin li rêxistinên cîhanî û Tirkiyê kir, di encama van zextan de, hevdîtineke birêz Omer Ocalan bi Rêber Apo re hate kirin. Dewleta Tirk xwest bi hevdîtina dawî ya bi Rêber Apo rola pêngava cîhanî lawaz bike û vala derxe, herwiha şerê taybet jî bide meşandin, lê lîstika Tirkiyê pir xuya û zelal bû. Ji xwe hevdîtina ku bi Rêber Apo re hate kirin cihê kêfxweşiyê bû. Tevî mesaca Rêber Apo pir kurt bû, lê bi wate û cewherî bû. Rêber Apo di mesaca xwe de diyar kir ku tecrîd û sîstema işkenceyê dewam dike, lê Rêber Apo li beramberî vê sîstemê berxwedaneke dîrokî di asta herî bilind dide meşandin."

### 'Wê aşîtî bi destê Rêber Apo pêk bê'

Nûha Umer anî ziman ku divê civak bi siyaseta dewleta Tirk neyê xapandin û wiha got: "Gerke civaka me di wê zanebûnê de be, bi axaftin û siyaseta dewleta Tirk a qirker neyê xapandin, ji ber siyaseta dewleta Tirk a dagirker diyare, bi taybet di rewşa dawî ya li Tirkiyê hate xuyakirin ku Tirkiyê çawa êrişî şaredariyên gel dike, bi zor û işkenceyê ji dest wan digire. Meşa Kulên ya ku bi rengekî girseyî û bi heybet hate herkandin, tê de hate tekezkirin ku çiqas rola Rêber Apo di çareserkirina pirsgirêkan de heye û her kes dixwaze azadiya Rêber Apo dike, ji ber Rêber Apo buye hêvî ji bo gelên cîhanê tevahî. Rêber Apo di mesaca xwe da diyarkirin ku hêza wî ya tewrî analîzkirinê têrê dike ku vê rewşa tundî û işkenceyê veguherîne rewşa siyasî û qanûnî bi rengekî aşîtane. Bêguman rewşa Tirkiye ne rehete û di bin zextekê deye, lê nikare dest ji kiriyarên xwe berde, ev yek jî xuyaye ji ber ku Tirkiyê cezayên displînê piştî hevdîtina nefermî ya dawî ya bi Rêber Apo re, cardin bi awayekî lez du cezayên dispilînê danî ser Rêber Apo."

### 'Bi hêza Rêber Apo wê pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareser bibin'

Nûha Umer axaftina xwe wiha qedand: "Rewşa tecrîdê ku Rêber Apo anî ziman ev yek bersiva Rêber Apo ji gotina dewlet Bexçelîre ya ku daxwaz kir ku Pkk nemîne, lê Rêber Apo ji pernsîpê xwe tucar venegeriyaye û venagera û got tecrîd dewam me, heger şert û mercên çareseriyê peyde bibie hêza min heye ku rewşê veguherînım rewşa aşîtıyê. Lewra pêwîste em destê Rêber Apo bi hêz bikin. Têkoşîn û berxwedana xwe weke gel a ji bo Rêber Apo nedin seknandin."



# Şehîd Cîhan Bilgîn: Em ê heta dawiyê şopdarên rastiyê bin

Nûçegihana ANHA'yê Cîhan Bilgîn beriya ku şehîd bibe diyar kirbû ku ew rewşa herêmê ji nêz ve dişopîne û ew ê heta dawiyê şopdarên rastiyê bin û wiha gotibû: "Hêza çeteyên dewleta Tirk ya dagirker nemaye, ew nikarin berxwe bidin."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Sûriye bi giştî û taybet Rojava piştî rûxandina rejîma Baas derbasî qonaxeke nû dibin, hevsengiyên li Rojhilata Navîn û Sûriyeyê wê çawa biguherin cihê meraqê ye. Ji aliyê din ve êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên bi navê Artêşa Niştimanî ya Sûriyê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin. Agirbesta ku dihat plankirin bi navbeynkariya hevpeymaniya navdewletî di navbera QSD û Tirkiyê de çêbibe, ji ber ku Tirkiyê wê herêmê 1 kîlometreyî bi çekên giran ve girêbide û weke herêmeke jor dixwest, pêk nehat. Di heman demê de êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li dijî Pira Qereqozaq û Bendava Tişrînê hatin şikandin. Li gorî nûçeya ANHA'yê hat ragihandin ku Tirkiye û komên çekdar li derdora pira Qereqozax û sînorê Kobanê hêz kom kirine. Nûçegihana ANHA'yê şehîd Cîhan Bilgîn ku li qada şer bû, beriya ku şehîd bibe derbarî rewşa dawî ya êrişan û berxwedana şervanan, ji rojnameya me re axivîbû.

### 'Berxwedaniyek bêhempa li Minbic û bendava Tişrîn tê meşandin'

Şehîd Cîhan Bilgîn anîbû ser ziman ku hêzên parastinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke QSD'ê, YPJ û hêzên Ewlekariya Hindirîn tekoşînekê bi hempa li hemberî komên çete didin meşandin û wisa dest bi axaftina xwe kiribû: "8'ê Berfanbara 2024'an piştî hilweşandina Rejîma Baas'ê ya Beşer Esed êrîşekê dagirkeriyê ya hemwext li ser Minbic û bajarokên weke Sirrîn, Seda Tişrîn û pira Qereqozaxê hat destpêkirin. Bi giranî bomberdimana bi balafirên bêmirov gelek zirar gehiştin erdnigarî û binesaziyên jiyanî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Gelek caran hewildan kirin ku ji bona derbasî navenda bajêr bibin lê ketin kêmîna hêzên QSD'ê yên girêdayi Meclisa Leşkerî ya Minbicê, YPJ û hêzên Ewlekariya Hindirîn. Di wan çalakiyên QSD de, çeteyan gelek windahî dan, hejmarek mezin alavên leşkerî hatin bi destxistin. Gelek çeteyan xwe radestî şervanên hêzên Meclîsa Leşkerî kir û gelek jî dîl hatin girtin. Hejmara komên çete yê din jî neçar man ku paşda birevin. Şêrvanên QSD'ê û YPJ'ê gelek gundên li derdorê Minbicê li çeteyan paqij kirin û gund hatin rizgarkirin. Balafirên keşfê yên bêmirov niha bênavber li ser herêmê difir e. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker nikarin şer bikin, ji ber wê bi teknîka deste xwe bikartînin. Ev qasî hêza komên çete nîne ku sînge sîng li hemberî şervanên azadiyê berxwe bidin. Di heman demê de, hemberî êrîşên esmanî yên gengaz tedbîr hatine girtin di aliyê şervanan ve. Beriya demekê jî, êrişeke hewayî di aliyê dagirkerîya Tirk ve hat pêkanîn. Ji ber amadekariya hêzên parastinê ev êrîş jî hat vala derxistin. Dewleta Tirk ya dagirker ji bona dagirkirina axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê teknîka destê xwe de hemû kiriye, bin xizmeta komên çeteyan de. Bajaroka Bendava Tişrîn tê zanîn ku bi piranî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêdiviya kehrebê li wir dihat meşandin. Piştî bombebarana bendavê heya di wan dema jî kehrebe qut bûye. Di her êrîşên dewleta Tirk ya dagirker vê care jî, cihên xizmetgûzariyê hatin armanckirin. Di çapemeniya alîgir ya dewleta Tirk ya dagirker dîsa serî li şerê taybet hatiye dayin. Nûçeyên weke, komên çete Pira Qereqozax û Bendava Tişrînê girtine durê rastîyê ne û derewin. Ev berowajîkirina rojevê û veşartina derûniya binketinê ye. Heya niha jî serwerî destê şervanên QSD û YPJ'ê û Meclisa leşkerî ya Minbicê de ye. ji ber metirsiya ber lêdana balafirên dagirkeriya Tirk karker nikarin derbasî bendavê bibin û ji bona bikarin pêdivîyên gel yê kehrebê çareser bikin. Di heman demê de, ji bona pêywendiyên gel di navbera hev de qut bibe, cihên şebekeyên weke RCell û Sûriya Tell tên armancgirtin. Ev yêk jî pêşî girtina ragihandina azad û dengê rastîyê ye. Hewildidin derewên xwe bi raya giştî bidin pejirandin. Lê em ê wek endamên Ragihandina Azad her dem şopdarê rastiyê bin ku ji bona gelê me û cîhan giştî derewên çete û dagirkeran fêm bikin."



### 'Armanca dagirkeran Kobanê ye'

Şehîd Cîhan bibîrxistibû ku hewildana dagirkeriyê hemû ji bona bajarê berxwedanê Kobanê ye û wiha domandibû: "14'ê Berfanbara 2024'an di navbeynkariya hêzên Hevpeymana Nav Dewletî, di navbera hêzên Fermandariya QSD'ê û çeteyên dagirkeriya dewleta Tirk hevdîtinek li ser Pira Qereqozaxê pêkhat. Agirbesta yêk alî ya di aliyê fermandariya QSD'ê we hatiye ragihandin pêşî hatgirtin. Hinceta dewleta Tirk ya dagirker wergerandina gora Silêman Şah li Eşmê li Qereqozax e. Lê armanca rastî dagirkirina bajarên berxwedanê Kobanê û çêkirina baregehên leşkerî ne. Di sala 1927'an Silêman Şah ava Qereqozaxê bin av bû û xenikî. Li wê demê gora wî qela Cebir hat çêkirin. Piştî wê 1923'an li peymana Lozanê biryar hat girtin ku heya cihê gora Silêman Şah qaşo weke axa Tirkiyê bê hesibandin. Di sala 1973'an de wê care di navbera hikûmeta Baas'ê ya hilweşîyayî û û rayedarên dewleta Tirk ya dagirker de hevpeymanek din hat çêkirin. Ji ber ku wê dîrokê bendava Tebqa hat çêkirin û gora Silêman Şah dê binav biba. Ji ber wê sedemê gor birin pira Qereqozaxê. Di sala 2015'an de jî, dîsa bi navbeynkariya hêzên navdewletî de encama hevdîtinên navbera YPG û YPJ'ê û dewleta Tirk ya dagirker yên wê demê de gora Silêman Şah birin gundê Aşmê ya girêdayî bajarê Helebê. Dîsa piştî êrişên li ser Minbic û Bendava Tişrînê ku dewleta dîsa zivirandina gora Silêman Şah li pira Qereqozax kirin rojevê de. Endamê Fermandariya Giştî ya QSD'ê Mazlum Ebdî daxuyaniya xwe de erenî nêzî wê pêşnîyarê bû. Lê weke her dem dewleta Tirk ev jî berowajî dan



zivirandin. Derdorê gundên ku sînorê bajarê Kobanê cîh digirin bên vala kirin, baregehên leşkerî bidin avakirin. Yêk kîlometre qaşo dur gora Silêman Şah durbikevin. Pira Qaraqozak cihekî stretejîk û girîng e. Di sînorên bajarê weke Kobanê, Eyn Îsa û Sirrînê cih digire. Armanc tê xuyakirin. Ev armanca dagirkirina bajarê Kobanê ye. Hincetên Silêman Şah bi xwera hêsanî rêya dagirkeriyê tên peyda kirin. Lê em hemu dizanin ku bajarên bi xwîna şehîdan hatiye rizgarkirin hêsanî dewleta Tirk ya dagirker nikare dagir bike."

### 'Bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî şervanên azadiyê axa xwe diparêzin'

Şehîd Cihan axaftina xwe wisa qedandibû: "Raste êrîş û dagirkeriyek mezin heye lê kêlekê da berxwedanî û tekoşînek mezin jî tê kirin. Ji bona şikandina vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin serî li tevlîheviya didin. Gelên ku wê derê jiyan dikin de, dewleta Tirk ya dagirker hewil dide, di nav pêkhateyên Ereb, Siryan û Ermen û gelê Kurd de aloziya bidin avakirin, serî şerê taybet û yê derûnî didin. Lê bersiva gelê herêmê zelal û diyar e. Di kelêka şervan û zarokên xwe cih digire û zerevanîyekê bigire, heya xwarin çêkirinekê alîkarî û piştgirî didin şervana û hêzên parastina herêmê. Raste agirbestek hatiye ragihandin, lê bi ti awahî ev biryar nayê meşandin di aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve. Wek rojnamevan me nêrînên gelek welatiyan jî girt wisa tînin ser ziman 'Em ê bi rihê gelê şoreşgerî berxwe bidin. Ev axa xwe bi saya ramanên Rêber Apo rizgar bû û em ê heya dawiyê li gel hêzên xwe yên parastinê cih bigirin.' Ev ji me re did e xuyakirin ku gelê ku bedêl daye bi ramanên rêberê netewî Rêber Apo hatiye perwerde kirin ti cara paş da gav neavêje."